

dawiyê, bi navê malbatê, birêz Dr.Memo helbesteke bi şewat pêşkêş kir û sipasiya beşdarên kir. Ji bilî gotinên ku li ser gorê hatin xwendin, gelek birûsk ji partiyên Kurd, malperên Kurdî û kesayetyên navdar ji malbatê re hatine şandin, ji nav wan birûsakan, birûska weşana me NEWROZ û ya Kovara PIRSê bûn, deqên wan li jêr in:

Birûska Sersaxiyê

Malbata nivîskar û rewşenbîrê Kurd ê dilsoz REZO!

Nivîskarên bi zimanê Kurdî!

Piştî kêferat û berxwedaneke derdora salekê bi nexweşiya penceşêrê re, rewşenbîr û nivîskarê zimanê Kurdî, kesayetiya dengewar û dilsoz, mirovhez û zîrek, birêz Rezoyê Osê ji nav me bar kir.

Bêgumane her kesê ku bi çand û rewşenbîriya Kurdî re têkildar û mijûl e, nav û dengê mamoste di kastîna rewşenbîriya Kurdî û rola wî ya erênî di civakê de bihîstîye.

Dilê me hemiyan bi koçbarkirina birêz Rezo êşiya.

Hêvî û omîda me ew e ku cihê wî buhuşt be, serê malbat, mirov û xwediyan wî, rewşenbîrên Kurd hemiyan xweş be!

Weşana NEWROZ/05.03.2010Z ,2620K

Birûska Serxweşiyê

Malbata mamoste REZO!

Rewşenbîr û berketiyên zimanê Kurdî!

Me di desteya Kovara PIRSê de, bi dilekî tev kul, keser û kovan nûçeya dilêş a koçbarkirina rewşenbîrê Kurd ê navdar, endamê payebilind ê Kovara me Rezoyê Osê bihîst.

Buhuştî, di dirêjahiya temenê xwe de, ji bo ziman, wêje û toreya Kurdî xebateke tekûz û pîvayî bi rêve biriye. Li ser vê rêya dirêj a tev rêl û kelem, gelek cefa û astengî dîtine, lê wî bi dilê germ û hişê xwe yê vekirî ew derbas kirine. Weke me bira û mamoste Rezo di xebata hevbeş a Kovara Pirsê de naskiriyê, ji bo kar û xebatên

bilindkirina asta ziman û wêjeya Kurdî, ew mirovekî cansivik û pêşeng bû, bê dudilî, erk ustubarên xwe pêk tanîn.

Hemberî vê boneya gewre, Kovara PIRSê reş girê daye, bi melûlî û ustuxwarî gurzek gul diyarî rewanê wî dike, serxweşiya hemî rewşenbîr û berketiyên ziman û wêjeya Kurdî dike.

Bila gora te buhuşt be mamoste Rezo.

Serê malbata we xweş be!

Rezo, yek ji endamên damezrêner ên hevbenda kawa ya çanda Kurdî bû, ya gelek pirtûk û belgeyên hêja wergerandine ser zimanê Erebi. Herweha, wî di desteya Kovara Stêr a bi zimanê Kurdî de xebat kiriye. Gelek gotar, çîrokên zarokan, kurteçîrok û lêkolîn bi navê Aro, Rezo, Azad...di kovar û weşanên bi zimanê Kurdî de çî li welat çî li derveyî welêt nivîsandine. Ji sala 1993an ve, di desteya Kovara PIRSê de xebitî ye û ev berhemên jêr di hejmarên wê de weşandine:

Kovar PIRS/05.03.2010Z _2620K

Dumahîk : JI Ê MÊRTIR RE

Klêvayê di defterxanê de cilên birîndaran ji hev dikirin, tiştên di bêrikên wan de seh dikirin û ew datanîn refikên dolaban. Klêvayê di bêrika cilên Sarc de resimê xwe yê ko xwîna Sarc sorkirî bû peyda kir. Klêvayê gava ev dît ji xwe re got:"Ê mêtir birîndar bûye û îro di xestexana me de ye". Klêva rabû, çû cem gerîndeyê xestexanê û jê destûr xwest ko êdî di xizmeta nexweş û birîndaran de bixebite. Gerînde destûra wê da û Klêva xwe gihande ber serê "ê mêtir". Birîna Sarc xedar bû; dilê wî ji ber ve çû bû. Bijîşk bêgav man û lingê wî ê çepê jêkirin. Sarc gava çavên xwe vekirin li ber serê xwe xwediya teswîrê dît, roj bi roj ber bi xêr bû. Klêvayê terka wî ne da û piştî ko Sarc ji xestexanê derket, bû jina wî. Îro herdu jî divê fabrîkê de dixebitin. Sarcê yekling nema dikare çekan hilgire lê dikare wan çêke, jina wî jî arîkariya wî dike". Gotinên mihendis li hire qediyên û em tev de ketin xwarinxanê. Bêhemtê xwe em li wan digeriyan. Dawiyê me ew peyda kirin. Bûk û zavê xwe dabûn alîkî û li rex hev rûniştî taxafîn û taştîya xwe dixwarin.

(* **Kovara RONAHI-Hejmar 8- Yeksemb-1ê Çirya Paşîn 1942-Rûpel(8-9).**